

Veger bi alîkariya desthelatdaran

Heke te îzna îqamê li Norwêcê nebe, divê tu bivegerî bo welatê xwe. Tu dikarî bo vegera welatê xwe daxwaza piştgîriya pereyî bikî û li wir dest bi jiyaneke xweş bikî.

Tu dikarî daxwaza vegera bi alîkariya desthelatdaran bikî heke tu

- refz li ser daxwazname xwe ya penaberiyê û îqamê wergirtibe
- li benda bersiva daxwazname xwe bî
- bêyî îqama qanûnî li Norwêcê bî

Tu dê van tiştên li xwarê wergirî

- piştgiriya pereyî û ya kirdarî
- alîkarîkirinê bo peydakirina paseportê û belgenama seferê
- Bilêtên teyarê
- şîret ji aliyê Rêkxistina koça navdewletî (IOM) li Norwêcê.

Tu dikarî çî corê piştgiriya pereyî werbigirî?

- Heke tu berî mohleta te ya derketinê bi serve biçe, yan berî tu mohletekê wergirî daxwaz bikî, tu dê 20 000 hizra kirona wergirî.
- Heke tu piştî ku mohleta te ya derketinê biserveçû, daxwaz bikî, tu dê 7000 hizra kirona wergirî û 2000 kirona bo her zarokekê ku di bin hejde saliyê da ye li wî wextê ku tu daxwaza vegera bi alîkariya desthelatdaran kirî.

Digel wê yekê jî her malbateka xwedî zarok be dê piştgiriyeke 10000 kironî wergirin bo her zarokekê ku di bin hejde saliyê da ye û wê bivegere. Ev yek e bi tinê ji wan kesan digire yên ku berî mohleta wan ya derketinê biserve biçe, daxwaz dikin.

Tu dê wilo daxwaz bikî

Telefonê belaş bo IOM bike: 800 37 484

Herwisa to dikarî êmeylekê bo iomoslovarp@iom.int bişînî

Tu dê daxwazname xwe li www.iom.no bînî